11ê Hezîrana 2020î

# Dê Qaydeyên Nû Yên Ji Bo Parastina Ji Vayrusa Koronayê Yên Bi Awayê Sivikkirî Ji Roja Duşemê Ve Di Rewacê De Bin

Hin lidarxistinên bêtirî ji 100 kesî û şahîyên taybet ên heta 50 kesî dê karibin bi hindek sînorkirinan mumkin bin / dê ji sporên pêvebûnê yên hundirî yên heta 10 kesî re û sporên derveyî yên heta 30 kesî re destûr bê dayîn / Dê hin dezgehên bêhnvedanê û kêfkirinê karibin bên vekirin

Hikûmet danxuyandina jêrê herweha belav kiriye:

Ji tarîxa 15ê Hezîrana 2020î/Duşemê ve li Bakurê Ren-Vestfalyayê dê hin Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê bikevin rewacê. Ev nexasim ji alîyê têkilîkirina tevlîbûyîyan bi şertê ku hin pêdivê bên pêkanîn bên destûrdayîn, ev, wextê ku bivê ji bo mirov karibe bi tevlîbûyîyan re têkilî bike, li ser hin qaydeyên bi şertê hin pêdivê bên pêkanîn bên sivikkirin re têkildar e. Ev qayde hem sektora parekendeyê hem jî lidarxistin û kombûnên bi tevlîbûyîyên bêtirî 100 kesî elaqedar dike. Di çarçoveya pêdivêyên li ser paqijîyê, tedbîrên ewlehîyê û karina têkilîkirina bi tevlîbûyîyan re de ji bo rewşên îstîsnaî yên wek di salveger, zewac, lidarxistinên vaftîzê, rojbûn yan bidawîanîna xwandinê şahîyên taybet de tên lidarxistin de dê destûra heta 50 tevlîbûyîyan bê dayîn. Ji bolî van bi şertê ku hin pêdivêyên cûrbicûr bên pêkanîn, bar, avahîyên zindîbûnê û parken avê karibin çalakîyên xwe dewam bikin.

Sivikkirin dê ji bilî van ji bo sporên bihevvebûnê jî di rewacê de bin. Ji roja duşemê ve di hundirê cîhan de heta 10 kesan û li derveyê cîhan jî bi tevlîbûnên heta 30 kesan dê ji sporên bihevvebûnêre destûr bê dayîn. Pêşbirkên sporê yên di çarçoveya sporên kêfê û komî de bi şertê ku ji pêdivêyên cûrbicûr bên pêkanîn dê li odîtoryuman karibin bên kirin.

Li cîhên gelêrî dê sînorkirinên giring ên bihevvebûnê dewam bikin. Ji bilî van li cîhên gelêrî û hin cîlên xuyandî yên çûn û hatina mişterîyan li wan heye mecbûrîyeta bikaranîna parêzkara dev û difnî dê dewam bike. Ji bilî van lidarxistinên mezin dê heta tarîxa 31ê Tebaxa 2020î qedexe bimînin.

Li herêma Bakurê Ren-Vestfalyayê bipêşveçûnên erênî yên rewşa pandemîyê dihêlin ku guherînên tedbîrên parastina ji koronavayrusê bên pêkanîn. Ji qaydeyên sivikkirî yên pêşîn ên ji 20ê Nîsanê ve pêkhatî û pê de li Bakurê Ren-Vestfalyayê jimara enfeksîyonên nû ji sedî 75 kêm bûye. Ev bipêşveçûn jî destekê dide nexşerêya hikûmetê ya li ser pandemîya koronavayrusê. Tevgerên bi hişyarî û xwedanberpirsîyarî yên pirranîya mirovan dihêlin ku di rêya asabûna de gavên pêştir bên avêtin. Di tedbîrên parêzkar de pêkanîna sivikkirinên û bihevxistinên nerm, dimînê ser encamên her tim nirxandina pandemîyê.

Awayê nû yê Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê dê 15ê Hezîrana 2020î roja duşemê bikeve rewacê û bi awayekî mueqet dê heta 1ê Temûza 2020 di rewacê de be. Hûn dikarin ji vê girêdankî xwe bigihînin metne: www.land.nrw

## Hûrgilîyên bihevxistina nû

Di Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê yên Bakurê Ren-Vestfalyayê de ji tarîxa 15ê Hezîrana 2020î pê de bihevxistinên jêrî di rewacê de ne:

**1. Lidarxistin û şahî**

**Lidarxistin**
Li gora qaydeyên paqijîyê û navberê dê ji lidarxistin û kombûnên heta 100 kesî re destûr bê dayîn. Di bihevxistinê de tevlî pêkanîna kontrola paqijîyê û xwegihandinê, parastina navbera bi kêmayê 1,5 mîtroyî, babeta taqîbbûyîna tevlîbûyîyan û temaşegeran jî heye. Ji bo lidarxistinên bi tevlîbûyîyên bêtirî 100 kesî jî pêdivêyên pêvekî hene. Dê bi tenê eger bi desthilatên saxlemîyê yên têkildar re bên birêvebirin destûra wan bê dayîn. Ji bilî van ji bo van awayekî taybet î paqijîyê û parastina li dijî enfeksîyonê divê.

Eger pîlanên rûniştinê hatibin kirin, ji bo lidarxistinên di wan de kursîyên sabit hene pêdivêyên navbereke 1,5 mîtroyî û taqîbbûyîna tevlîbûyîyan ne di rewacê de ye. Ev ji bilî van ji bo xizmetên hînkirinê yên derveyê mufredatê yan lidarxistinên kulturî jî her weha ye. Ji pêdivêyên taqîbbûyînê re qeydbûna daneyên tevlîbûyîyan û sazkirina pîlanê rûniştinê yê ku cîhê her kesekî rûniştî bibelge dike divê.

Zêwên gelêrî, pêşangehên bajar/gund/kuçeyan, lidarxistinên nîşangirîya dijwar û araqê yan şahîyên berfireh ên wek wan bi kêmayî dê heta 31ê Tebaxa 2020î qedexe bimînin. Ev ji bilî van ji bo lidarxistinên muzîkê, zêwan û zêwên kulturê û sporê jî di rewacê de ye.

**Şahîyên taybet**

Di hîmê xwe de lidarxistinên awayê gelêrî dê qedexe bimînin. Lidarxistinên îstîsna jî şahîyên ji bo wek salveger, zewac, lidarxistinên vaftîzê, rojbûn yan bidawîanîna xwandinê yên li gora hin pêdivêyên xuyandî bên lidarxistin in. Eger bihevxistinên paqijîyê bên pêkanîn û karibe bi tevlîbûyîyan re têkilî bê kirin, lidarxistina şahîyên heta 50 tevlîbûyîyan rewa ye. Bi şertê ku ev pêdivê bên pêkanîn, navê di lidarxistinên mirîyên sivîl de û kombûnên ji bo mirîyan de parêzkarên dev û bêvlê bên bikarhatin. Ev lidarxistin di cîhên cuda de, di avahîyên xizmeta xurekîyê tên dayîn de û otêlan de dibin bên pêkanîn.

**2. Parekendeger, muzexane ve cîhên ku xizmeta xurekîyê dikin**

Ji tarîxa 15ê Hezîranê pê de dê sînorkirinên berfireh ên di warê parekendeyê de bên sivikkirin. Di çarçoveya cîhê firotinê yê mexazeyê de di şûna serê her 10 mîtroya çargoşeyî kesekî de dê serê 7 mîtroya çargoşeyî ji kesekî re destûra ketina hundirî bê dayîn. Ev ji bilî van ji bo sînorkirinên ji serdêrên muzexane, pêşangeh û baxçeyên heywanan pêkhatî jî di rewacê de ye.

Dê bar, li gora standardên paqijîyê û parastina ji enfeksîyonê yên di xizmeta xurekîyê de di rewacê de ne karibin çalakîyên xwe dewam bikin. Dê klab û klabên şeve girtî bin. Dê qedexeyîya li ser vekirîbûna avahîyên wek kerxaneyan, kerxaneyên qewlsitandinê û avahîyên wek wan dewam bike.

**3. Avahîyên kêfê û bêhnvedanê**

Ji tarîxa 15ê Hezîranê pê de li cîhên gelêrî û avahîyan dê çêkirina manqelê rewa be.

Dê bazarên tiştên ji destan li gora awayê pêdivêyên paqijîya taybet û parêzkarîya ji enfeksîyonê karibin bên lidarxistin. Bi ahenga bi desthilatên berpirsîyar re, bi pêkanîna awayê

paqijîya taybet û parêzkarîya ji enfeksîyonê, dê karibe destûra parken kêfê yên demkî yên pirranîya nîşandêran tevlîbûyî ne bê dayîn.

Avahîyên zindîmayînê û avgerm, dê bi pêkanîna standardên paqijîyê û parêzkarîya enfeksîyonê karibin çalak bin. Ev ji bilî van ji bo parken avê û hewzên kêfê jî di rewacê de ye. Dê di bikarhatina hewzên beş bi beş de hîç sînorkirinek tune be.

**4. Spor**

Bi komên heta 10 kesan, kesên ji du malbatên xizm yan xizmên ji yek azbatê dê ji roja Duşemê pê de karibin li deverên hundirî sporên xwe yên bi pêbûnê karibin bileyîzin. Li cîhên derveyî dê yek bi yek ji komên heta 30 kesan karibe destûra sporên bihevvebûnê bê dayîn. Di her du rewşan de jî dane divên karibin bên berhevkirin û bi tevlîbûyîyan re karibe bê têkilîkirin.

Bi şertê pêkanîna paqijîyê û awayê parêzkarîya ji enfeksîyonê dê ji pêşbirkên sporê yên komî û ji bo kêfê re jî di cîhên hundirî û odîtoryuman de destûr bê dayîn.